



- [Serrûper](#)
- [Alfabe](#)
- [Ferheng](#)
- [Ziman](#) 
- [Arşîv](#)
- [Editor](#)
- [Têkilî](#)
- [Lînk](#)
- [Danasîna Înstîtutê](#)
- [Danî / Dansk](#)

29 Sibat 2012

Înstîtûta Kurdî-dk 29ê Sibata 2012ê li Kopenhagê hate damezrandin. Bila pîroz be.

januar 2014

m t i o t o f l s

[« dec](#)

1 2 3 4 5
6 7 8 9 10 11 12
13 14 15 16 17 18 19
20 21 22 23 24 25 26
27 28 29 30 31

29ê Sibata 2012ê, roja çarşembê, roja bûyîna Înstîtûta Kurdî-dk ye.

Sibata îsal [2012] 29 roj in. Her çar sala carekê sibat dibe 29 roj. Lewma pîrozbahîya salvegera damezrandina înstîtutê dê çar sala carekê be, belê wê jî dê xêrek tê da hebe. Bila li Kurd û Kurdistanê pîroz be.

Înstîtûta Ziman û Perwerdeya Kurdî li Danmarkê

Înstîtûta Kurdî-dk, înstîtusyoneke zanistî ye. Statu û pozisyona rêvebirîya wê sîstemê akademîk e.

Sempozyum

Înstîtuta Ziman û Perwerdeya Kurdî Li Danmarkê [Înstîtuta Kurdî-dk] plan kirîye ku sempozyumekê bi navê **”Li dîasporayê giringîya makzimanî û perwerdeya bi makzimanî”** li Kopenhavnê pêkbîne. Ji bo pêkînana vê sempozyumê digel Komisyona Ziman û Perwerdeyê ya KNKê, Instîtuta Ziman û Çandê ya Kirmancî [Zaza] li Berlînê û Instîtuta Kurdî ya Stockholmê di resepsiyona 12ê Gulanê [2012] da hevdîtinek hate kirin. Wekî prensîp hate axivtin ku digel Instîtutên Kurdî yê li Köln, Bruksel û Parisê jî têkilî bête danan. Pêkînana vê sempozyumê digel komeleyên Kurdî yê li Danmarkê jî hate axivtin û Fey-Kurd, DKKC û Fokus-A jî hevkar û piştevanên vê xebatê ne.

Armanc ew e ku bispor û zanayên ziman û perwerdeya Kurdî yê li dîasporayê û herweha ji Kurdistanê jî bêne dawet kirin ku li ser mijarê gotûbêjêke zanistî pêkbêt ku ji bo kar û xebatên perwerdeya Kurdî li dîasporayê perspektîveke nû derkeve meydanê.

Instîtuta Kurdî-dk ji bo amadekirina vê sempozyumê di nav hewildanên peydakirina imkanan da ye. Bi vê armancê serî li wezaretên bi ziman û perwerdeyê ve girêdayî yê Kurdistan Federal hate dan ku ji aliyê malî ve destek bête dan. Herweha lêgerînên peydakirina sponsoran jî berdewam e.

Înstîtuta Kurdî-dk, bi xwezîkeyekê serî li wezaretên Roşinbîrî û Lawan, Perwerde û Xwandina Bilind yê Kurdistan Federal da û projeya sempozyumê pêşkêşî wan kir ku hevkarîya malî bikin.

Projeya ku Înstîtuta Kurdî-dk daye hersê wezaretan li jêr e.

Bo

Wezaretê Roşinbîrî û Lawan ya hukûmeta Herêma Kurdistanê-Iraq [*]

Hewlêr [Erbil]

Înstîtuta Ziman û Perwerdeya Kurdî Li Danmarkê [Înstîtuta Kurdî-dk] li 29ê Sibata 2012ê li paytextê Danmark Kopenhagê hate damezrandin.

Li Danmarkê nêzîkî 30 [sih] hizaran Kurd dijîn. Di nav vê hejmarê da ji hemû beşên Kurdistanê û herweha ji dîasporaya Tirkîyeyê Kurd hene. Di nav vê hejmara Kurd da nufûsa ciwanan gelek zêde ye.

Li Danmarkê di nav sîstemê perwerdeya fermî ya dewletê da dersên plankirî û sîstematîk yê bi makzimanê Kurdî nebin jî astengên huqûqî û qanûnî nînin. Ji 8 heta 12 zarokên Kurd ra heke famîlya bixwazin dewlet imkanê perwerdeya makzimanî dide. Lê mixabin civata Kurd ya li Danmarkê di warê perwerdeya makzimanê xwe da aktîv nîne û hejmareke gelek kêma famîlyayên Kurd vê daxwaza perwerdeya makzimanî ji dewletê dikan. Vê gavê bi hejmareke gelek kêma kurs û perwerdeya Kurdî heye.

Înstîtuta Kurdî-dk ji ber vê hewcehîya giring ya perwerdeya makzimanê Kurdî hate damezrandin. Înstîtuta Kurdî-dk ji bo parastina huvîyeta neteweyî û nifşê Kurd li Danmarkê perwerdeya Kurdî şertê bingehîn yê man û nemanê dibîne. Nufûsa Kurd her diçe zêde dibe û divêt hewcehîya perwerdekirina zarok û ciwanên Kurd ya bi zimanê Kurdî her bi çi rengî be bête bi cih înan. Heke ev karê perwerdeya bi zimanê Kurdî neyê kirin nifşê nû dê asîmîle bibe û ji etnîk orjîna xwe, ji kultur û folklorê xwe dûr bikeve û di nav civata Danmarkî da bihele.

Ji ber vê tehlîkeyê, Înstîtuta Kurdî-dk plan dike ku digel perwerdeya Kurdî, xebat û aktîvîteyên sosyal, kulturî û hunerî jî pêkbîne ku îdentîteta Kurdî herdaîm bête parastin û domandin. Înstîtuta Kurdî-dk plan dike ku bi van kar û xebatan ve bibe pîreke dînamîk di navbeyna Kurdên li Danmark û welatê wan Kurdistanê da.

Ji bo vê armancê hewcehîya sereke bi desteka Wezaret û dem û dezgehên bi ziman û perwerdeyê ve peywendîdar yê Kurdistanê heye. Înstîtuta Kurdî-dk bi imkanên ji civata Kurd ya li Danmarkê kar û xebata xwe didomîne, lê eve têra nake. Lewma Înstîtuta Kurdî-dk daxwazê ji we dike ku hem di warê bi cih înan programên xebatê yê di navbeyna Danmark û Kurdistanê da, hem jî bi hevkarîya malî destek bête dan.

Bi taybetî em dixwazin zarok, ciwan, grûbên xwandekaran ji bo seredanîya dibistan, unîversîte û dezgehên peywendîdar bînine Kurdistanê. Herweha ji Kurdistanê jî grûbên zarok û ciwanên xwandekar dawetî Danmarkê bikin ku seredanîya dem û dezgehên perwerdeyê bikin. Bi vî rengî em dixwazin têkilîyeke sosyal û kulturî di navbeyna Kurdên dîasporayê û welaî da organîze bikin. Herwisa li Danmarkê ji bo zarok û ciwanên Kurd û binemalên wan kom û kombûnên serwextkirina giringîya perwerdeya Kurdî bikin. Ji bo van kom û kombûnan ji Kurdistanê mamosta û bisporên ziman û perwerdeyê dawet bikin ku semîneran bidin. Ji bo agahdarîyên zanistî yê li ser ziman û perwerdeyê jî sempozyum û konferansan amade bikin ku Kurdên dîasporaya Danmarkê mifayî jê werbigirin ku şûra neteweyî ya wan bilind û jînde bimîne.

Ji bo realîzekirina van plan û projeyan em daxwazê ji wezaretên we dikin ku hevkarîya Înstîtuta Kurdî-dk bikin.

Di gava ewil da me plan kirîye ku li payîza îsal [2012] li Kopenhagê bi navê **"Li dîasporayê giringîya makzimanî û perwerdeya bi makzimanî"** sempozyumeke zanistî ya du rojî pêkbînin. Ji bo vê sempozyumê ji unîversîteyên Kurdîstana Federal, ji parçeyên di yê Kurdistanê û herweha meydanên dîasporaya Kurdî mamosta û bisporên ziman û perwerdeyê dê bêne dawet kirin. Mijara sempozyumê û terkîba wê bi sê wezaretan ve [Wezaretê Xwandina Bilind + Wezaretê Perwerdeyê û Wezaretê we] girêdayîye. Sempozyuma zanistî dê bi hejmareke nêzîkî 50-60 [pêncî-şêst] kesan pêkbê. Mesrefa vê sempozyumê bi texmînî dê li dora 50-60 [pêncî-şêst] hizar dolaran be.

Ji bo vê xebatê me hewcehî bi desteka we ya malî heye. Lewma em daxwaza 20 [bîst] hizar dolaran ji wezaretê we dikin ku em bikarin mesrefa vê sempozyumê razî bikin [Ji Wezaretê Perwerdeyê û Wezaretê Xwandina Bilind jî me daxwaza desteka malî kirîye.] Heke ev meblax ji alîyê we ve ne mumkun be, hingê hindî ku butçeya we dest dide hevkarîyê bikin. Ji bo xerca mayî em dê serî li sponsoran bidin. Em li hêvîya bersiva we ya pozîtîv in.

Ji nihe ve em spasî hevkarîya we dikin.

Digel rêz û silavên me yê germ.

ROJAN HAZIM

Rêvebirê Giştî yê Înstîtuta Ziman û Perwerdeya Kurdî Li Danmarkê [Înstîtuta Kurdî-dk]

5 Hezîran 2012, Kopenhag

[*] Ev proje bo Wezaretê Perwerdeyê ya hukûmeta Herêma Kurdistanê û Wezaretê Xwandina Bilind ya Herêma Kurdistanê jî hatîye dan.

**

Noteke giring:

Ev projeye hate betal kirin. Wezaretê Kulturê û Lawan ya Hukûmeta Herêma Kurdistanê hevkarîya malî nekir. Mixabin ku hêj jî ji ber hesabên biçûk yê polîtîk projeyên neteweyî giring nayên dîtin. Wezaret bin her çî dem û dezgeh bin, heke bi van hesab û kitabên biçûk û berjewendîyên partîkanê piştevanîya projeyên neteweyî nekin xwe biçûk dikin. Li Kurdîstana Federal gelek mixabin ku hêj jî zihnîyeta lokalîst nehatiye terk kirin. Ziman, kultur, huner û edebîyat zemînên hevpar yê neteweyî ne û di van waran da nabe ku herêma bête fikirîn û hereket kirin. Dem û dezgehên fermî yê Kurdîstana Federal ji bo projeyên neteweyî

imkanên malî li goreyê krîterên objektîv û neteweyî nadin, di çarçoveya "kê nêzîkê min e" vedibirin. Ewe hem ne rast e, hem jî ne neteweyî ye, ne ehlaqî ye, ne wijdanî ye û ne jî adil e.

Digel vê reftara negatîv jî, têtê hêvî kirin ku ev polîtîka ne neteweyî bête terk kirin û bêne ser rêya rast û neteweyî û imkanên malî li ser projeyên neteweyî adilane bêne belav kirin.

Xebat nasekinin helbet. Imkanên pêkînana semîner, sempozyum û konferansan dê bêne peyda kirin. Kar û barên ziman, edebî, hunerî û kulturî her bi çî rengî be dê bêne domandin.

Instîtuta Kurdî-dk

Kanûna Pêşîn [December] 2012

 [Print](#)  [PDF](#)

Comments are closed.

Copyright © 2014 [Înstîtuta Ziman û Perwerdeya Kurdî li Danmarkê](#). Made by [KAE](#).

**

Sempozyum

Înstîtuta Ziman û Perwerdeya Kurdî Li Danmarkê [Înstîtuta Kurdî-dk] plan kirîye ku sempozyumekê bi navê **”Li dîasporayê giringîya makzimanî û perwerdeya bi makzimanî”** li Kopenhagenê pêkbîne. Ji bo pêkînana vê sempozyumê digel Komisyona Ziman û Perwerdeyê ya KNKê, Instîtuta Ziman û Çandê ya Kirmancî [Zaza] li Berlînê û Instîtuta Kurdî ya Stockholmê di resepsiyona 12ê Gulanê [2012] da hevdîtinek hate kirin. Wekî prensîp hate axivtin ku digel Instîtûtên Kurdî yên li Köln, Bruksel û Parisê jî têkilî bête danan. Pêkînana vê sempozyumê digel komeleyên Kurdî yên li Danmarkê jî hate axivtin û Fey-Kurd, DKKC û Fokus-A jî hevkar û piştevanên vê xebatê ne.

Armanç ew e ku bispor û zanayên ziman û perwerdeya Kurdî yên li dîasporayê û herweha ji Kurdistanê jî bêne dawet kirin ku li ser mijarê gotûbêjê zanistî pêkbêt ku ji bo kar û xebatên perwerdeya Kurdî li dîasporayê perspektîveke nû derkeve meydanê.

Instîtuta Kurdî-dk ji bo amadekirina vê sempozyumê di nav hewildanên peydakirina imkanan da ye. Bi vê armançê serî li wezaretên bi ziman û perwerdeyê ve girêdayî yên Kurdistana Federal hate dan ku ji alîyê malî ve destek bête dan. Herweha lêgerînên peydakirina sponsoran jî berdewam e.

Înstîtuta Kurdî-dk, bi xwezîkeyekê serî li wezaretên Roşinbîrî û Lawan, Perwerde û Xwandina Bilind yên Kurdistana Federal da û projeya sempozyumê pêşkêşî wan kir ku hevkarîya malî bikin.

Projeya ku Înstîtuta Kurdî-dk daye hersê wezaretan li jêr e.

Bo

Wezaretê Roşinbîrî û Lawan ya hukûmeta Herêma Kurdistanê-Iraq [*]

Hewlêr [Erbil]

Înstîtuta Ziman û Perwerdeya Kurdî Li Danmarkê [Înstîtuta Kurdî-dk] li 29ê Sibata 2012ê li paytextê Danmark Kopenhagê hate damezrandin.

Li Danmarkê nêzîkî 30 [sih] hizaran Kurd dijîn. Di nav vê hejmarê da ji hemû beşên Kurdistanê û herweha ji dîasporaya Tirkîyeyê Kurd hene. Di nav vê hejmara Kurd da nufûsa ciwanan gelek zêde ye.

Li Danmarkê di nav sîstemê perwerdeya fermî ya dewletê da dersên plankirî û sîstematîk yên bi makzimanê Kurdî nebin jî astengên huqûqî û qanûnî nînin. Ji 8 heta 12 zarokên Kurd ra heke famîlya bixwazin dewlet imkanê perwerdeya makzimanî dide. Lê mixabin civata Kurd ya li Danmarkê di warê perwerdeya makzimanê xwe da aktîv nîne û hejmareke gelek kêma famîlyayên Kurd vê daxwaza perwerdeya makzimanî ji dewletê dikan. Vê gavê bi hejmareke gelek kêma kurs û perwerdeya Kurdî heye.

Înstîtuta Kurdî-dk ji ber vê hewcehiya giring ya perwerdeya makzimanê Kurdî hate damezrandin. Înstîtuta Kurdî-dk ji bo parastina huvîyeta neteweyî û nifşê Kurd li Danmarkê perwerdeya Kurdî şertê bingehîn ye man û nemanê dibîne. Nufûsa Kurd her diçe zêde dibe û divêt hewcehiya perwerdekirina zarok û ciwanên Kurd ya bi zimanê Kurdî her bi çî rengî be bête bi cih înan. Heke ev karê perwerdeya bi zimanê Kurdî neyê kirin nifşê nû dê asîmîle bibe û ji etnîk orjîna xwe, ji kultur û folklorê xwe dûr bikeve û di nav civata Danmarkî da bihele.

Ji ber vê tehlîkeyê, Înstîtuta Kurdî-dk plan dike ku digel perwerdeya Kurdî, xebat û aktîvîteyên sosyal, kulturî û hunerî jî pêkbîne ku îdentîtêta Kurdî herdaîm bête parastin û domandin. Înstîtuta Kurdî-dk plan

dike ku bi van kar û xebatan ve bibe pireke dînamîk di navbeyna Kurdên li Danmark û welatê wan Kurdistanê da.

Ji bo vê armancê hewcehîya sereke bi desteka Wezaret û dem û dezgehên bi ziman û perwerdeyê ve peywendîdar yên Kurdistanê heye. Înstîtuta Kurdî-dk bi imkanên ji civata Kurd ya li Danmarkê kar û xebata xwe didomîne, lê eve têra nake. Lewma Înstîtuta Kurdî-dk daxwazê ji we dike ku hem di warê bi cih înan programên xebatê yên di navbeyna Danmark û Kurdistanê da, hem jî bi hevkarîya malî destek bête dan.

Bi taybetî em dixwazin zarok, ciwan, grûbên xwandekaran ji bo seredanîya dibistan, unîversîte û dezgehên peywendîdar bînine Kurdistanê. Herweha ji Kurdistanê jî grûbên zarok û ciwanên xwandekar dawetî Danmarkê bikin ku seredanîya dem û dezgehên perwerdeyê bikin. Bi vî rengî em dixwazin têkilîyeke sosyal û kulturî di navbeyna Kurdên dîasporayê û welatî da organîze bikin. Herwisa li Danmarkê ji bo zarok û ciwanên Kurd û binemalên wan kom û kombûnên serwestkirina giringîya perwerdeya Kurdî bikin. Ji bo van kom û kombûnan ji Kurdistanê mamosta û bisporên ziman û perwerdeyê dawet bikin ku semîneran bidin. Ji bo agahdarîyên zanistî yên li ser ziman û perwerdeyê jî sempozyum û konferansan amade bikin ku Kurdên dîasporaya Danmarkê mifayî jê werbigirin ku şûra neteweyî ya wan bilind û jînde bimîne.

Ji bo realîzekirina van plan û projeyan em daxwazê ji wezaretên we dikin ku hevkarîya Înstîtuta Kurdî-dk bikin.

Di gava ewil da me plan kirîye ku li payîza îsal [2012] li Kopenhagê bi navê **"Li dîasporayê giringîya makzimanî û perwerdeya bi makzimanî"** sempozyumeke zanistî ya du rojî pêkbînin. Ji bo vê sempozyumê ji unîversîteyên Kurdîstana Federal, ji parçeyên di yên Kurdistanê û herweha meydanên dîasporaya Kurdî mamosta û bisporên ziman û perwerdeyê dê bêne dawet kirin. Mijara sempozyumê û terkîba wê bi sê wezaretan ve [Wezaretê Xwandina Bilind + Wezaretê Perwerdeyê û Wezaretê we] girêdayîye. Sempozyuma zanistî dê bi hejmareke nêzîkî 50-60 [pêncî-şêst] kesan pêkbê. Mesrefa vê sempozyumê bi texmînî dê li dora 50-60 [pêncî-şêst] hizar dolaran be.

Ji bo vê xebatê me hewcehî bi desteka we ya malî heye. Lewma em daxwaza 20 [bîst] hizar dolaran ji wezaretê we dikin ku em bikarin mesrefa vê sempozyumê razî bikin [Ji Wezaretê Perwerdeyê û Wezaretê Xwandina Bilind jî me daxwaza desteka malî kirîye.] Heke ev meblax ji alîyê we ve ne mumkun be, hingê hindî ku butçeya we dest dide hevkarîyê bikin. Ji bo xerxa mayî em dê serî li sponsoran bidin. Em li hêvîya bersiva we ya pozîtîv in.

Ji nihe ve em spasî hevkarîya we dikin.

Digel rêz û silavên me yên germ.

ROJAN HAZIM

Rêvebirê Giştî yê Înstîtuta Ziman û Perwerdeya Kurdî Li Danmarkê [Înstîtuta Kurdî-dk]

5 Hezîran 2012, Kopenhag

[*] Ev proje bo Wezaretê Perwerdeyê ya hukûmeta Herêma Kurdistanê û Wezaretê Xwandina Bilind ya Herêma Kurdistanê jî hatîye dan.

**

Noteke giring:

Ev projeye hate betal kirin. Wezaretê Kulturê û Lawan ya Hukûmeta Herêma Kurdistanê hevkarîya malî nekir. Mixabin ku hêj jî ji ber hesabên biçûk yên polîtîk projeyên neteweyî giring nayên dîtin. Wezaret bin her çî dem û dezgeh bin, heke bi van hesab û kitabên biçûk û berjewendîyên partîkanê piştevanîya projeyên neteweyî nekin xwe biçûk dikin. Li Kurdîstana Federal gelek mixabin ku hêj jî zihniyeta lokalîst nehatiye

terk kirin. Ziman, kultur, huner û edebîyat zemînên hevpar yê neteweyî ne û di van waran da nabe ku herêmî bête fikirîn û hereket kirin. Dem û dezgehên fermî yê Kurdistan Federal jî bo projeyên neteweyî imkanên malî li goreyî krîterên objektîv û neteweyî nadin, di çarçoveya "kî nêzîkî min e" vedibirin. Eve hem ne rast e, hem jî ne neteweyî ye, ne ehlaqî ye, ne wijdanî ye û ne jî adil e.

Digel vê reftara negatîv jî, tête hêvî kirin ku ev polîtîka ne neteweyî bête terk kirin û bêne ser rêya rast û neteweyî û imkanên malî li ser projeyên neteweyî adilane bêne belav kirin.

Xebat nasekinin helbet. Imkanên pêkînana semîner, sempozyum û konferansan dê bêne peyda kirin. Kar û barên ziman, edebî, hunerî û kulturî her bi çî rengî be dê bêne domandin.

Instîtuta Kurdî-dk

Kanûna Pêşîn [December] 2012